# Bedenini ateşe veren Yunanlı Elefteriya'nın mektubu -Kürtçe-

ATİNA (29.03.2006)- Yunanistan'ın başkenti Atina'da 23 yaşındaki iki çocuk annesi Yunanlı Elefteriya Fortulaki isimli genç kadın Kürt Halk Önderi Abdullah Öcalan üzerindeki baskıları protesto için bedenini ateşe verdi. Tüm müdahalelere rağmen kurtulamayan Elefteriya Fortulaki Kürtçe yazdığı mektubunu yayınlıyoruz:

"Zarokên min ê hêja, kurê min û keça min delal, hevalê min Şivan, dayika min û bavê min, hevalên min... Ez hildibijêrim cihê vê çalakiyê, ji bo çalakiya xwe, ji ber ku hevalê Rohat jî beriya niha bi çend salan, li vir agir berdabû bedena xwe.

Dayika min dibêje; 'Tu ji Yewnanistanê hez nake, ji bo wê tu bi Kurdî dipeyive.' Dayika min! Ez ji Yewnanistanê hez dikim. Yewnnasistan welatê min e. Ez ji Kurdistanê jî hez dikim weke welatê xwe. Ez ji zimanê Yewnanî jî pir hez dikim ku zimanê dayika min e, her wisa ji zimanê Kurdî jî hez dikim.

Dayikê! Dayika min! Biratiya gelan tiştekî pir xweş e. Gelê Kurd jî ji bo biratiya gelan têdikoşe. Gerîllayên Hêzên Parastina Gel HPGê têdikoşin li dijî dewleta Tirk ku êşkencê li Kurdan dike. Polês û eskerên Tirk zarokên piçûk, pîr û kalan dikujin û ceza dikin ji ber ku gelê Kurd mafên xwe, zimanê dayikê û perwerdeya Kurdî dixwaze. Ji ber ku dixwazin wek mirovan bijîn. Dewletên Kurdistan parvekirine li çar parçeyan Kurdan dikujin.

Dayika min! Zimanê Yewnanî û perwerdeya yewnanî heye li unîversîteyê. Dewleta me jî heye, lê kurd dewletek wan tune ye. Mafên ji bo hîndariya zimanê Kurdî li dibistana bilind tune ye. Zarokên me yê bi du zimanan biaxivin. Bi zimanê dayika xwe yewnanî û bi zimanê bavê xwe kurdî. Zarokên min ji sedî pêncî yewnanîne, ji sedî pêncî Kurd in.

Ez dizanim vê çalakiya nebaş e, lê têkoşîn e, fermandara Hêzên Parastina Gel Viyan Soran jî di 1'ê Sibatê de wisa kir, hevalê Rohat jî wisa kir. Hevalê Rohat min nas nekir, lê min nas kir ji rûpelên 'Dengê Kurdistanê' Piştî (Berî) çalakiya Fermandara HPGê Viyan Soran, min dest bi zanîngehê kir, ez zewicîm û min du zarok kir. Ez gelek ji Şivan hez dikim. Navê zarokên min navê bavê Şivan û dayika Şivan in. Niha ez dîsa hatim dibistanê ji bo fêr bibim hunerê û biçim televîzyona kurdî. Min di hevdîtina xwe de ya li cem hevala Rozerîn û li cem hevalê Aydin vê hêviya xwe got. Zarokê min li cem bavê xwe mezin dibin. Lê hîn ez diçim zanîngehê. Şivan şev û roj dayike û bave ji bo zarokên me. Daxwaza min e, zanîngehê xilas bikim û di ROJ-TVê de bibim xebatkar û bi karibim bibim endama PKKê. Berî vê, daxwaza min bû ez bibim gerîlla, lê niha biryara min a dawî, (piştî dayikbûyîna zarokan) ez dixwazim endama siyasî ya PKKê, ne ji bo şer. Di jiyana

xwe de ji zarokên xwe, zilamê xwe, dayika xwe û bavê xwe, Kurdistanê, zimanê Kurdî û çanda Kurdî, hevalên min û dîroka PKKê hez dikim. Dîroka PKKê dîroka ji agir e! Silavên germ ji bo serokê mezin ji bo gelê Kurd birêz Abdullah Ocalan, ji bo hemû girtiyên siyasî, ji bo gerîllayên Hêzên Parastina Gel li ser çiyayên Kurdistanê, ji bo hemû xebatkarên li televîzyona ROJ-TVê û kanala muzîkê Mezopotamyayê, ji bo hemû xebatkarên radyoya DENGÊ MEZOPOTAMYAYÊ, ji bo hemû hunermendan û muzîsyonên KOMA BERXWEDANê silavên germ. Ji bo malbatên şehîdan û ji bo dayikên aştiyê destê wan maç dikim. Silavên germ ji bo hemû şehîdên Kurdistanê û Rojhilata Navîn. Ez NEWROZa îsal pîroz dikim (piçekî dereng) weke Zekiye Alkan, Sema Yuce, Ronahî, Berîvan, Rehşan Demîrel û mezinên din ku bi biryara xwe gelê Kurd û Kurdistan serbilind û dîroka Kurdistanê firehtir kirin.

Silav hevalê Necmî

Silav hevalê Cîhat ku ber vê çend rojan min hûn nas kir û hurmeta min heye ji bo we jî û ji bo hemû kesên ku têkoşîn dikin ji bo welatê xwe Kurdistanê. Hemû bimînin her di başiyê de!

Bi can û bi dil
ELEFTER'YA

Kes nikare roja me reş bike
Azadiya gelê Kurd û serok APO azadiya ji bo hemû gelan li cîhanê ye.
Bijî biratiya gelan, bijî aştî
Viyan Jiyan e!"